Kurtiyek li ser arîşe û çavdêriya pîran

Omer Mûsilî

Pîrbûn piresêseka biyolojî ye, girêdayî geşepêdana mirovî ye. Malbat destpêka jiyana bingehîne bo mirovî, cihê sirûştî ye ji bo geşepêdana kesayetiya mirovî ye û her dem pê ve girêdaye û taybetmendiya her malbatekê ji malbatekê heye û her civakekê ji civakê, kartêkirinê xwe li rewşa pîran dike. Pêdiviye çavdêriya malbatê ji pîran re li ser van xalan bihê wergirtin:

-Dabînkirina germatiya bo pîran û hest bi aramî û xweşiyê di nav malbatê de.

-Dûrkirina pîran ji malbatê, bê razemendiya wan şaşiyeka herî mezin e, gişt pêdivî wan bihêne dabînkirin.

-Danûstandinên sirûştî li gel pîran ji endamên malbatê.

Arîşeyên pîran

1-arîşeyên derûnî :

-Arîşa mezinbûnê, kêmbûna hêza leşî, gelek pîr tûşî nexweşiyên derûnî dibin

-Arîşa xaneşênî

-Hest bi xwe dike ku jiyana wî/ê bê mifaye

-Hest bi tenêbûnê û xemokiyê dikin

2-Arîşeyên civakî :

-Kêmasiya danpêdana endamên xêzanê bi pîran.

-Bawerî bi xwe kêm e, ku karibe guhertinan di nav xêzan û civakê de çêbike.

-Kêmasiya pişikdariya pîran di çalakiyên rêkxirawên komelayetî û rewşenbîrî de.

-Cudabûn û tenêbûn, kartêkirineka mezin li ser pîran dihê kirin.

3-Arîşeyên pêdiviyên aborî:

-Kêmbûna dahatiyan, ew dahatî nagunce li gel rewşa bazarê û gelek ji wan bê dahatîne.

-Gelek pîr hene ku bê mûçe xaneşînî nê.

Çi pêşkêşî pîran dihê kirin, li xaniyên çavdêriya pîran?

Çavdêriya xizmetkarî:

Ji bo wan, li Xaniyên pîran xizmeteka baş û bi rêk pêk dihê pêşkêşkirin, ji ber ku gelek ji wan pîran neşên bi erkê xwe rabin ji ber egera tenduristî û mezinbûna wan, divê hindek kesên taybetmend bi wî erkî rabin.

Li vê derê, ji erkê xaniyên pîran evene:

-Di rojê de sê caran, ta çar caran dabînkirina xwarinê û bighê ber textê wan.

-Bi rojane paqijkirin û dirustkirina cihên wan.

-Rojane cihên wan bihê guhertin û di nav baxçê Xaniyê pîran de bihêne gerandin.

-Dabînkirina amîren ku bişên danûstandinê li gel kargiriya Xaniyê pîran bikin ji bo pêdiviyên wan.

-Dabînkirina alîkariyê bo şûştina leşê wan .

Çavdêriya Tenduristî:

Yeke ji pêdiviyên serekî bo pîran ew jî tenduristiye wan e û pîr gelek tûşî nexweşiyan dibin û bi taybetî di vê demê de.

-Berdewamî karkirina beşê tenduristî û berdewamî hebûna pizîşk li Xaniyê pîran.

-Veguhestina pîrên ku êşên wan nahêne çareserkirin bo nexweşxanan

-Berdewamî temaşekirina tenduristiya pîran bi gişti.

Çavdêriya Derûnî:

Ji ber egerên jiyanê, gelek pîr tûşî nexweşiyên derûnî dibin, û di demek bi hest û nazik re derbaz dibin ji ber vê pêdivî ye ku danîstandinek sirûştî û bi hurmet û têghiştina rewşa wan û divê amedebûna berdewam ji kesên taybetmend ji bo pêşkêşkirina şîretên derûn û ger pêdivî be, vegustina wan bo nexweşxanên derûn bo çareserkirinê.

Dawî

Pêdivî ev core xizmetgozarî bo pîrên Kurdistanê bihê pêşkêşkirin, ji ber ku gelek êş û azar zehmetî di jiyanê de wan dîtine, pêdivî li her parêzgeheka herêma Kurdistanê cihên taybet bihêne avakirin çi ji Xaniyên pîran û çi ji cihên bêhinvedanê û bi taybet li parêzgeha Duhokê, ev jî erkeke ji erkên hukûmeta herêma Kurdistanê ye .